# ZÊR

A RASTEQİN

Kelam dı
destpêke de
hebû û Kelam
lı hında Xwedê bû.

Jıyan dı Wê
de bû û jıyan
nûra mırovan bû.

Yûhenna 1, 1 û 4

İsa disa beri
da wan û got:
"Ez ronahıya dınê me;
yên ku lı pêy mın bên,
tu cari dı tarıyê
de nameşın.
Û ew bı xwe ji dıbe
ronahıya jıyanê."

Yûhenna 8, 12

İsa jı wi re got:
"Rê, rasti
û jıyan ez ım.
Ne bı rêberıya
mın be, tu kes
nıkare were cem
Bav (Xwedê)."

Yûhenna 14, 6

İsa sekıni, bang
kır û got
"Ger ki ti bıbe,
bıla bê, lı ba mın
vexwe.

Mina ku
Kıtêb gotıye;
yên ku bawerıya xwe
bı mın bine ewê çemê
avên zındi dı nav
wan de bıherık e."

Yûhenna 7, 37-38

Ey hemi kesên
westayi û yên
bargıran;
werıne ba mın
û ezê rehetıyê
bıdıme we.

Jı ber ku nirê
mın hêsan û barê
mın sıvık e.

Metta 11, 28 û 30

Lewra berdêla
gunehê mırıne;
lê belê xelat a Xwedê,
dı Xudan İsa Mesih
de jıyana bêdawi ye.

Rom 6, 23

Ya Xweda;
jı mın gunehkari
re dılovanıyê bıke.

Lûqa 18, 13

İsa Mesih dıbêje ku:
"Kesên ku gotınê
mın guhdari bıke û
jı yê ku ez şandıme
bawerıyê bine,
jı wi re jıyana bêdawi
heye û nayê hıkmê,
lê belê jı mırınê
derbasi jıyanê bûye."

Yûhenna 5, 24

Jı ber ku Xwedê ûsa
jı dınê hez kır ku,
Lawê xwe yi
tekane da;
ta ku heçi mırovên
bı Wi baweri anıye
bıla helak mebe,
feqet jıyana wan
i bêdawi hebe.

Yûhenna 3, 16

Lê belê bona
gunehê me Ew
bırindar bû,
jı dılreşıya me
Ew êşıya;
cezaya ku berdêla
sılameta me bû,
hate ser Wi;
û me bı bırinên
Wi şifa dit.

İşaya 53, 5

A vay; lı ber
deri dısekınım
û lı deri dıxım;
ger yek dengê mın
bıbıhize û deri veke,
ezê bıçım ba wi...

Wahi 3, 20

Ta ku, Mesih
bı wasıta bawerıyê
lı dılê we de rûne.

Efes 3, 17

Lê belê jı heçi kesên
ku Ew qebûl kırın
û bı navê Wi baweri
anin desthelat a zarokên
Xwedê bûnê dan.

Yûhenna 1, 12

Êdi bona paqıjbûna
gunehê xwe tobe bıkın,
û vegerın, ta ku,
lı ber Xudan demên
nûkırınê bên.

K. Şagırtan 3, 19

Jı ber ku Kurê
Mırov hatıye,
ku yê wındabûyi bıgere
û wi xılas bıke.

Lûqa 19, 10

İsa dıbêje ku:
"Hemûyên ku Bavo
dane mın wê bên ba mın;
û ki ku bê mın,
ez tu cari navêjım
wan der ve."

Yûhenna 6, 37

Çı lazıme ez bıkım,
ku xılas bım?...
Bawerıya xwe bı
Xudan İsa bine,
hım tu xılas bıbe,
hım ji malıyên te.

K. Şagırtan 16, 30-31

Êdi werın,
jı ber ku hertışt
amade ye.

Lûqa 14, 17

Hemûyên ku bawerıya
xwe bı Wi binın,
wê bı saya navê
Wi efûbûna guneha
bıstin ın.

K. Şagırtan 10, 43

İsa jı bona gunehên
me hate radestkırın,
û bona paqıj bûna me
ji jı nuv da ve jin bû.

Rom 4, 25

İsa Mesih dıbêje ku:
"Mihê mın dengê mın
dıbıhizın, ez ji wan
nas dıkım û ew lı pêy
mın tên; ez jıyana bê
dawi dıdım wan;
ew ji heta hetayi
helak nabın û tu kes
nıkare wan jı destê
mın bıstin e."

Yûhenna 10, 27-28

Lewra Mesih
ji bona ku hûn lı pêy
Wi bıçın, minokek
jı we re dani û bona
we elem kışand.

1. Petrûs 2, 21

Tê gıhiştına
cihad a baş ya
bawerıyê bıke.

1. Tim 6, 12

Êdi em bı Wi re,
bı wasıta Vaftizê
ve ketın nava mırınê;
ta ku, bı emrê
Bavo Mesih çawa
jı mırınê rabû,
em ji wısa dı nûbûna
jıyanê de bımeş ın.

Rom 6, 4

Û a vay, ez hemû rojan,
heta dawıya dınê
tevi we me!

Metta 28, 20

Bıla ronahıya we lı
ber mırovan wısa
şewle bıde, ku ewana
xebatên we yên xweş
bıbinın û jı Bavê
we yi yê lı ezmanan
re hemdan bıkın.

Metta 5, 16

Lê belê dıbêjım:
"Bı Ruh ve bımeşın,
wê demê hûn tu
xwastına bedenê
ninın cih."

Gal 5, 16

Ruh'ê Piroz
yê Xwedê bı
keserê mexın.

Efes 4, 30

Ki jı mın û gotınên
mın şerm bıke,
wê Kurê Mırov ji
dema bı mezınahıya
xwe, Bavê xwe
û melayketên
piroz ve were,
jı wi kesi şerm bıke.

Lûqa 9, 26

Giya hışk dıbe,
çiçek dıçılmıse;
lê belê gotınên
Xweda'yê me her
tım dısekın e.

İşaya 40, 8

Wê erd û ezman
derbas bıbe,
lê belê gotınên
mın derbas nabın.

Lûqa 21, 33

Dua bıkın û bı
gırtına hemû
xwastınê xwe
bawer bıbın,
û wê jı we re be.

Marqos 11, 24

Hûn bı navê mın
her çı bıxwazın,
ezê wê bıkım;
ta ku Bav dı Law
de bılınd bıbe.

Yûhenna 14, 13

Belê, mın jı te
bı hezkırına bê
dawi hez kır;
jı ber vê yekê mın
te bı dırûdıyê
kışand xwe.

Yêremya 31, 3

Metırse,
çımki ez bı te re me...

İşaya 41, 10

Ez dıçım,
ku jı we re cih
amade bıkım.

Û ez herım cih
amade bıkım,
bona hûn ji lı cihê
ku ez lê me bın,
ezê disa vegerım û
we bıgırım ba xwe.

Yûhenna 14, 2-3

Jı ber ku Xudan bı xwe...
wê jı ezmên bê xwar û
pêşıyê wê mıri dı Mesih
de bıwejın; dawıyê ji yên
dıjin, em, yên hatıne
berdan, bı wan re bona
ku Xudan dı hewa de
pêrgin bıkın; wê me dı
nava ewran de bıgırın
bıbın, û bı vi avayi emê
her tım bı Xudan re bın.

1. Sel 4, 16-17

Û mın ezmanek
nû û erdek nû dit.

Û wê jı çavan
hıstêran paqıj bıke;
û êdi wê mırın
tunebe û şin û gıri
û êş ji wê tunebe.

Wahi 21, 1 û 4

A vay, zû têm.

Û yê dıbıhize,
bıla bêje were.
Û yê ku ti bûye bıla
were, yê bıxwaze
bıla bê berdêl ava
jıyanê bıgre.

AMİN; WERE,
YA XUDAN İSA!

Wahi 22, 12, 17 û 20